Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1284 | 25-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Mizgîn berhema têkoşîna Rêber Apo ye’

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

**Hûnermend û yek ji endamê klîba Mizgîn Qadir Çat da xuyakirin ku erka mezin ya hunermendan e ku hewildanên Rêber Apo yên çareseriyê bidin danasîn û wiha got: “Em çi bikin jî em deyndarê Rêber Apo ne”**



Klîbek ji straneke Kurdî cara yekem li mala li gundê Amara ya li navçeya Xelfetî ya Rihayê ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan lê ji dayik bûye, hate kişandin. Strana “Mizgîn”, ku gotin û muzîka wê ji hêla Koma Hevra ve hatiye nivîsandin, ji hêla hunermendên Navenda Çanda Mezopotamya (MKM) û Koma Hevra ve hate pêşkêş kirin. Klîpa ku li studyoyê û Amarayê hatiye kişandin, 35 enstrumanên cûda yên ku ji hêla hunermendan ve hatine lêxistin di klîpê de cih digire. Klîb dê di salvegera biryara darvekirinê yê ku di 29’ê Pûşbera 1999’an de li derheqê Rêber Abdullah Ocalan de hatiye birîn, li ser medyaya dijîtal were parvekirin. Di heman rojê de, Şêx Saîd û 46 hevalên wî li Amedê hatin darvekirin.

Di derbarê klîpa bi navê Mizgîn ya gundê Amara yê Rêber Apo lê jidayikbûye hatiye kêşandin de, hunermend û yek jî stranbêjên klîpa Mizgîn Qadir Çat ji rojnameya me re axivî.

**Amadekarî û pêşkêşkirina klîpê**

Navê stranê: Mizgîn
Gotin û mûzîk: Koma Hevra û hunermendên NÇM’ê Qadir Çat, Arhat, Zeynep Dogan,
Dîrok û Amadekirina klîpê: 18’ê Pûşber 2025 – Amara
Derhênerî: Beşa Sînema
Weşankirina klîbê: 28’ê Pûşber 2025
Teknîk: Sazûmaniya Sanatça
Beşek ji stranê wiha ye:
“Mizgîn
Mizgîn ji wera ey welat Ji Amarayê roj hilhat
Ronî da axa pîroz Ji Rihayê (ji îmralîyê) deng dihat
Wek Îbrahîm û Manî Wek Zerdûştê Medyayî
Reşand tovê jîyanê azadkir Kurdistanê
Avda axa Kurdistan ava dikir nû jîyan
Zevîyên Mezopotamya kirye baxçê gulîstan
Hat hat hat rojame
Mizgîn ji wera gelê me
Hat hat apê me Serok û rêberê me
Azat dike cîhanê Bi fikir û ramanên xwe
Wa hat roja me şewqa xwe daye serme
Bi felsefe ya azat roni dike riya me
Rojê şitla azadî çandiye li Kurdistanê
Ew şitil mezin dibe dibe dara jîyanê
Her çiqilêk ji darê dibe çandek civakê
Her pêlekî ji darê dibe rengê jîyanê
Her gellek avadibe di bin sîya wê darê
Kulîlk dide vedibe nav baxçê gulîstanê
Hatt hatt hat hat rojame
Mizgîn ji wera gellê me
Hat hat apê me Serok û rêberê me
Azat dike cîhanê bi fikir û ramanên xwe
Wa hat roja me şewqa xwe daye serme
Bi felsefe ya azat roni dike riya me


**‘Ji Amara yanî gundê Rêber Apo stran gotin ji bona me vejîneke nû bû’**

Hûnermend û yek jî endamê klîba bi navê Mizgîn, Qadir Çat da xuyakirin ku bi kelecaneke mezin amadehiya klîpê de cih girtine û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Em bi hevalên koma musîkê ya bi navê koma Hevra me ev strana bi navê Mizgîn amade kir. Bi kelecaneke malbata Rêber Apo em pêşwazî kirin. 17’ê Pûşberê me li Amedê ev stran xwend, lê di 18’ê mehe de jî me klîp li navçeya Xelfetî gundê Rêber Apo ev stran amade kir. Bi rastî şênî û welatiyên ku gundê Amara jiyan dikin jî pêşwazî û eleqeyek pir mezin nîşanî me dan. Em di demijmêrên seharê de gihiştin gundê Amara. Ev klîp ji aliyekê ve dîrokî ye û cara yekem li ber mala Rêber Apo ve klîpekê wiha tê kişandin. Ev jî bi saya têkoşîna Rêber Apo ya 27 salan û pakrewanên doza azadiyê pêkhat. Ev dara ku Rêber Apo di zarokatiya xwe de di bin de diliyist û hîmên şoreşa azadîyê di bin de diavêt me taybet li bin wê dare klîp kêşand. Me di heman demê de jî weke nîşaneya ku hebûna Rêber Apo di klîpê de li wir darek çand. Klîpekê hevpar û girseyî bû. Em pir bi kelecan bûn û ez weke kesayet jî pir şanazim ku me hindirê wê klîpê de cih girt. Ev zarokên ku ji bona cejnê bi Rêberê gelan Rêber Apo re hevdîtin kiribûn, me ev jî dîtin û guhdar kirin. Bi rastî jî dema mirov wêneyekê Rêber Apo jî dibîne miro kelecan digire, me li ber mala wî stran gotin. Ev rastîyeke ku li ber derê Rêber Apo jiyan kirî û şopê xwe tê de hiştibû dîtin jî ji me re vejînekê nû bû.”

**‘Klîpa Mizgîn bingeha hîmê civaka demokratîk e’**

Qadîr Çat bibîrxist ku ji bona fêmkirina Rêber Apo çiqas stran û helbest bên nîvîsandin û gotin jî kêm e û wiha bi dawî kir: “Hunermendên NÇM’ê û koma Hevra weke erkekê mezin dîtin û ev stran derxistin. Me fikrandineke hevpar bi hevre civand û nêrînekê derket û di encamê de jî berhema strana Mizgîn çêbû. Ji bona derhênerî û nivîsandina senaryo jî beşa sînema her tişt girt li ser milê xwe. Di her alî de berhemekê xwezayî û kolektîf derket holê. Em weke hunermendên şoreşa Kurdistanê em ê ji bona xurtkirina bingeha hîmê civaka demokratîk xebatên wiha bidomînin. Ji ber ku em hunermend jî şagirtên Rêber Apo ne û erka hunermendan ya herî mezin Rêber Apo fêmkirin û dana naskirin e. Ji ber wê yekê berdewamiya van klîpan û bi vî şêwazî wê her di dema pêş de jî berdewambe. Em dîsa jî di serî de ji bona ev firsend ji me re avakiriye ji Rêber Apo re, hevalên ku keda wan di vê klîpê de çêbû koma Hevra, hunermendên NÇM, di serî de endamên malbata Rêberê gelan Rêber Apo û welatiyên gundê Amara re spas û şanaziya xwe pêşkêş dikin.”

Bi kamîreya Ayşa Silêman



Gundê Beroj

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER GERA PIR Û NEDIYARIYA CÎ**

**Av û ax ket lingê wî:**
- Pir geriya; hingî geriya perîşan bû.
**Bêjinga bêxweyî ye:**
- Kesê pir digere û nayê zanîn ka li kû ye, jê re tê gotin.
**Çêleka mozgirtî ye:**
- Li cihê xwe nasekine.
**Dinya da ser piyekî/dinya da ser piyê xwe:**
- Pir geriya; li her derê geriya.
**Garisê li ser defê ye:**
- Kêliyekê di cihê xwe de nasekine.
**Ji pêlavê ma simik, ji kopal ma kefik:**
- Pir geriya; bi salan geriya; wisa geriya heta ku cil li ber neman.
**Kuçikê li ti cihan reş nakin:**
- Li cihekî demdirêj namînin; cihên xwe zû diguherînin.
**Lingên wî nakevin bin de.**
- Di cihê xwe de nasekine; heta êvarê digere.
**Navika wî avêtine nava malan:**
- Bi heman wateyê.
**Navika wî avêtine ser banan:**
- Bi heman wateyê.
**Para gerokan çû bablîsokan:**
- Ji bo kesê li mala xwe nasekine û zererê dibîne tê gotin.
**Qulekê bernade:**
- Gerok e; mal bi mal digere; ciyek nîne neçiyê.
**Se disekine ew nasekine:**
- Pir dixebite; bi her derê ve dibeze; nasekine.
**Se dihewe ew nahewe:**
- Bi heman wateyê.
**Seyê pîsotayî ye:**
- Pir digere; ji xwe re nasekine; karekî nake.
(Seyên lingên wan dişewitin di cihê xwe de nasekinin)
**Serûbin kir:**
- Li her cihî geriya.
**Taştiya wî li ser pişta kêrvoşkê ye:**
- Zetimkirina wî zehmet e; li cihekî nasekine; mirov nikare bibîne.

**LI SER DAYÎK Û ZAROKAN**

**Efare ye:**
- Zaroka dawiyê ye.
**Kezebker e:**
- Bê zarokên wê kêliyekê debara wê nabe.
(Ker ji dehşikên xwe pir hes dikin)
**Kezeba min e:**
- Dayîk ji bo zaryên xwe dibêjin.
**Yê bin bêjingê ye:**
- Zarokê dawiyê ye.
**Yê bin berûşê ye:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 10’emîn salvegera komkujiya Kobanê




Di 25’ê Pûşpera 2015’an de çeteyên DAIŞ’ê nêzî saet 4’ê sibehê de xwe berdan nav bajarê Kobanê û hin gundên wê û komkujî pêk anîn. Di encamê de 253 kesan jiyana xwe ji dest dan.R-4

## Mezopotamya kevnareya dewlemendiya jiyana mirovahiyê ye




Mezopotamya di dilê Rojhilata Navîn de cih digire. Cihê wê yê erdnîgarî di navbera du çemên mezin Dîcle û Firatê de ye, ji ber axa bi bereket, peydakirina avê ya pêbawer û avhewaya xweş ji bo çandiniyê, geşbûna şaristaniyên destpêkê hêsan kir.R-6

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1284 | 25-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## ‘Demokratîkbûna Sûriyê rêya derketina ji qeyranê ye’




Bi hilweşîna rêjîma Baas a qirker re hikumeta Şamê ya veguhêz hate ser desthilatdariya Şamê, tu guhertin çênekir, lê tundî û kuştin zêde bû. Xelasbûna Sûriyê ji vê tundî û qirkirinê, bi demokrasî û biratiya gelan e.R-3

# PÊVAJO FERSENDEKE Û DIVÊ TIRKIYÊ DEST JÊ BERNEDE

Di 27’ê Sibata îsal de, Rêber Apo bangeke dîrokî kir û pêvajoya ‘Aştî û Civaka Demokratîk’ da destpêkirin. PKK û tevahiya aliyên Kurdî ev bang pêşwazî kirin û bi erkên xwe yên dîrokî rabûn. Li ser asta cîhanê jî ev bang erênî hat dîtin û deng veda. Lê tevî ku 118 roj di ser banga Rêber Apo re derbas bûne hîna jî dewleta Tirk tu gavên berbiçav ji bo serxistina pêvajoyê neavêtiye. Endamê Desteya Diplomasî ya PYD’ê li Ewropayê Fûad Umer da zanîn ku pêvjoya aştiyê fersendeke dîrokî ye û divê dewleta Tirk dest jê bernede.R-5




## Çend gotin li ser wêjeyê (1)



Her şoreşeke dîrokî li gorî bîrdoziya xwe hin armancan datîne pêş xwe û ji bo civaka ku dixwaze biafirîne wêjeyekê li gorî felsefa xwe derdixe holê. Li gelek welatan pêşîn di wêjeyê de proyotîpên civaka siberojê di wêjeyê de tên afirandin.R-7

## Di Roja Cîhanî ya Jin di Dîplomasiyê de; Pêşengtiya jina Kurd




Di 24’ê Pûşpera sala 2022’an de Roja Cîhanî ya jin di Dîplomasî de, ji aliyê Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî bi hejmara 12 hezar û 427’an hate ragihandin. Ev yek ji bo naskirina rol û xebatên jin di warê dîplomasî de, hat destnîşankirin. Di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de pêşengtiya jinê ev xebat di wateya wê ya rast de, pênase kir.R-2


Têbikoşin, nebin qurban
Nehîr pale R-2


Dewlet gelan naparêzin!
Dilyar Cizîrî R-4


Îran dê bikare ji bin wan êrîşan rabe?
Zekî Bedran R-5


Pêşîlêgirtina şer
Farûk Sakik R-5


Pêşbirkên wêjeyî hene lê çanda pêşbirkê tune ye
Kemal Necim R-7

# Di Roja Cîhanî ya Jin di Dîplomasiyê de; Pêşengtiya jina Kurd

Di 24'ê Pûşpera sala 2022'an de Roja Cîhanî ya jin di Dîplomasî de, ji aliyê Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî bi hejmara 12 hezar û 427'an hate ragihandin. Ev yek ji bo naskirina rol û xebatên jin di warê dîplomasî de, hat destnîşankirin. Di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de pêşengtiya jinê ev xebat di wateya wê ya rast de, pênase kir.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**




### Danasîna dîplomasî

Dîplomasî ji bo xurtkirina pêwendiyên di navbera gel, kom û dewletan de ye, bi taybetî di dema şer de, ji bo belavkirina aştiyê û çareserkirina qeyranên di navbera netew û dewletan de, di heman demê de şêwazeke danûstendin û diyalogê ye. Her wiha dîplomasî ew e ku rêya çareseriyên hemû pirsgirêkên li pêşiya aştiyê ye û ji bo avakirin û xurtkirina têkiliyan di navbera rêxistin an jî welatan de. Li Rojavayê Kurdistanê yek ji xebat û stûnên herî bingehîn yên ku bi xwe re serkeftiyên mezin avakirine, Xebatê dîplomasiyê ye. Ev xebat di hemû qadan de çi siyasî û çi leşkerî û xebatîn civakî dibe, tê meşandin.

### Di nirxandin û pênasekirina dîplomasiyê de, wiha hatiye gotin

Bi gotineka din, hate lihevkirin ku"Dîplomasî" wekî têkilîyeka ku bingeha xwe heye û bi rêya qanûn û rêgezan tê parastin û çênabe ku tu alîyek binpê bike an jî derbas bike. Herwiha, hin kes hene ku "Dîplomasî"yê wekî huner û rêbazekî danûstandinê di navbera dewletan de, an jî peywendîyên li ser asta kesayetan di civakê de jî, pênase dikin. Di heman demê de, dîplomasî wekî têkilîyên birêxistinkirî ên di navbera dewletan de ye, hunera birêvebirina karûbarên dewletan, hunera pêkanîn û serkeftina siyaseta dewletê ya derve ye. Li ser vî esasî, êdî Dîplomasî di qada siyaseta derve de, bû yekem gava ku divê were avêtin, ji ber ku ew bi rêya Dîplomasî dewlet siyasetên xwe yên derve û têkilîyên xwe bi alî û hêzên siyasî yên din re, pêk tînin. Lewma dîplomasî wekî xebata nûnertî û danûstandina ku di navbera dewletan de ye, di çarçoveya têkilîyên navdewletî de ye, pêk tê. Dîplomasîya ku rêbazên din ên siyaseta derve wekî hêza leşkerî û alavên aborî destekê didin wê, wekî dîplomasîya çalak tê binavkirin.

Dîplomasî di wateya xwe ya nûjen de, tê wateya "Komek ji têgihaştin, rêgez, bergirî, merasîm, sazî û rêgezên navdewletî yên ku têkilîyên di navbera dewlet û birêxistinên navdewletî û nûnerên dîplomatîk birêxistin dikin. Armanc ji vê yekê jî xizmetkirina berjewenîdyên bilind (ewlekarî û aborî), siyasetên giştî û belgekirina di navbera berjewendîyên dewletan bi rêya peywendîyan û pevguhartin, bergirîyên danûstnadinên siyasî û pêkanîna hevpeymanên navdewletî.

Di heman demê de, dîplomasî zanist û hunereke birêxistinkirin, birêvebirina têkilîyên navdewletî ye, nûnertîya hikûmet û parastina berjewendiyên dewletê yên niştimanî. Ev yek jî ji alîyê nûnerên dîplomatîk bi rêya danûstandinan pêk tê. Herwiha, em dikarin bibêjin ku dîplomasî ew rêgezên navdewletî yên birêxistinkirî û bergirîyên ku girîngîyê didin birêxistinkirina têkilî, peywendî û hevpeymanên di navbera yekîneyên siyasetê yên navdewletî de. Ev rêgez jî wekî qanûn ku divê her alî pêk bîne û dewlet jî berpirsê pêkanîna wê ye û birêxistinkirina wê li pêşîya civaka navdewletî ye. Di heman demê de, dîplomasî zanistek e ku şandina şandayan, konsolosxane, baylozxane û karûbarên wan birêxistin dike û vê yekê jî li gorî qanûna navdewletî ku her kesî li ser hev kiriye, pêk tîne.

### Rola jin di xebatên Dîpolmasî de

Piştî çirûska 19'ê Tîrmehê gelek tişt hatin guhertin û Şoreşa Rojava bi şoreşa jinan hat naskirin ku jin roleke pir mezin lîstin di hemû waran de û bi taybetî di warê siyasî û diplomasî de. Piştî wê jî di sala 2013'an de Komîteya Têkiliyên Jinan a Dîplomatîk hat avakirin û bi demê re xwe berfireh kir di gelek bajaran de heta gihîşt asta Ewropa û Rojhilata Navîn û bi vî rengî jinan diplomasiya xwe û têkiliyên xwe ava kirin. Armanca wê guhertina zîhniyeta ku bi hezaran salan hatiye meşandin li ser asta Rojhilata Navîn û cîhan bi giştî jî. Jin di Komîteya diplomasî de, serbixwe ne û ruxseta xwe ji Rêveberiya Xewser girtiye wekî sistemek di hundirê Rêveberiya Xweser de û destek didin jinên di hundirê Rêveberiya Xweser de. Şandeyên ku tên Rojava û hem jî nêrînên ku tên girtin di vê qadê de roleke jinan heye, di heman demê de şandeyên jin li Rojhilata Navîn û Dewletên Ewropayê jî hene. Lihevkirin û hatina şandeyan li Rojavayê Kurdistanê hişt ku destekdayîn çêbibe hem ji aliyê jin ve hem jî ji aliyê wan ve.

Di Rojava de jinên pêşengtiyê di aliyê têkiliyan de dike, bala jinên cîhanî û rêxistinên jinan kişandina ser têkoşîna jinên Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê û sîstema wê ya xweser a di qadê civakî, siyasî, aborî û hwd…. Ev jî nimûneyeke ku hemû jin ji xwe re bingeh bigirin. Herwiha dîplomasiya jin di Rojavayê Kurdistanê de, dixwaze bi hemû jinên welatên Rojhilat Navîn û derve re, di milê zanistî, xurtkirin û tecrûbeyên xweparvekirin de, xebatên hevbeş li hemberî zihniyeta ku dijbertiya jinê dike, bide meşandin.

Di sîstema Netewa Demokratyîk a Rêveberiya Xweser de, jinan bi hemû pêkhateyên xwe di tevahî herêmê de cihê xwe di astên herî girîng û pêş de girtin. Em di sîstema hevserokatiyê de, dibînin ku jin rola pêşengtiyê di xebatê giştî û xweser de dilîze. Di rêvebirina xebatê dîplomasiyê de ku em niha dibin şahidê gelek gavên girîng û dîrokî di asta cîhanê de avêtine de, bi pêşengtiya jinê tê kirin. Vê yekê jî hişmendiya pergalê yên ku li ser jinê hatine teysandin, guhartin û li dijî wê hêz û îradeya jina pêşeng a ku dikare cihê xwe di hemû xebatan de bigre, raber kirin.

### Girîngiya xebatên Dîplomasî

Şoreşa Rojava di bingeha xwe de bi şoreşa jinê naskiriye. Herwiha bi feraset û bi felesefeya Jin, Jiyan, Azadî îro jina kurd li her qadekê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê cihê xwe girtiye, ne bi rengê teşe û wêne. Lê bi deng, reng û biryardariya xwe. Ev dihêle ku teysandinekî proja demokratîk a ku pêşengtiya wê di hemû qada de jine, ji derve re cihê balkêşiyê be. Li ser vê balkêşiyê jî îro bi sedan jin ji Rojhilata Navîn û derveyî Rojhilata Navîn berê xwe didin Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rohilatê Sûriyê û tecrûbeya jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di gelek mijara de meraq û lêkolîn dikin. Da ku vê modêlê derbasî welatê xwe bikin û têkoşîna xwe xurt bikin.

### Astengî û pirsgirkên ku jin di karê dîplomasî de dikişîne

Astengiyên ku di xebata dîplomasî de derdikevin. Yek jê pisgirêkên mezin siyasetên ku îro li ser bingeha berjewendiya dûrî exlaq tê meşandin û bandora wê ya ku li jinê dike, jin dibe qurban, penaber dibe û tê çewsandin. Herwiha şerê ku hîna li Sûriyê dewam dike û li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî bi taybet, di heman demê de li herêma beravê komkujî û binpêkirinên ku çêbûne, encama zihniyeta cîhadperestiya ku kete şûna Baasê de. Ev jî pirsgirêkeke nû ku hat pêşiya jinê. Di heman demê de yasaya ku qaşo ji bo Sûriyê ye, lê di bingeha xwe de aramî û demokrasiyê pêş nexe. Berûvajî wê destûrekî inkar û nedîtina rasiya Sûrî hem demokratîk, hem pirengiya wê neberçav girtine. Ev yek wê ne aramiyê pêk bîne, lê wê şer gurtir bike.

Herwiha pirsgirêkên din rewşa aborî, lîstokên ku li ser Sûriyê heyî û taybet milê dewleta Tirk de ya ku agirbestê pêk nayîne û ne jî destê xwe ji Sûriyê dikşîne. Ev hemû li ser bingeha ku çawa karibin Sûriyeke ne demokrat ava bikin, lewma rola jin û pêşengtiya jin di pêvajoya pêşiya me de gelek girîng e.

## Ji Pênûsa Jin

### Têbikoşin, nebin qurban

**Nehîr Pale**

Di encama şerê di navbera hêz û dewletan de her tim talanî, koçberî û kuştin çêbûye. Bi taybet jin û zarok ên bê çekin û nikarin parastina xwe bikin têne kuştin. Mînaka Xeza li holê ye. Bi wî şerê siyasî yê di navbera Israîl û Hemas de komkujî pêktên, yên dibin qurban jî jin û zarok in.

Em balê bikşînin ser gotina qurbanî; jin çawa dibin qurban û kî wan dixe vê rewşê. Civaka zayendperest di merasîmên xwe yên olî de her tim jin kirine qurban, niha jî di şerên navbera dewletan de mîna berxikan wan qetil dikin. Jin bi xwe dibin sedema ku têkevin vê rewşê de. Jina lawaz, radestî mêr û civaka zayendperest û ol perestî bûye wê her tim bibe qurban. Jina têdikoşe û li ber xwe dide herî kêm nakeve vê rewşê de. Çiqasî têkoşînkirine ne girîng e, biryar dane ku dengê xwe bikin û bibin xwedî helwest û bê parastin nemînin. Pirsgirêka jinê ne tenê şidet û zayendperestî ye, bê hedef jiyan kirin kêmasiya herî mezin e. Temenê xwe ji bo çi xerc kiriye nediyare, ew zarokên ku zayîne jî xwedî lê dernakevin.

Destpêke jin bi xwe dibe sedema ku wê bikin qurbana şer. Eger xwe ji vê rewşê dernexîne wê hîs neke ku însan e. Têkoşîn neke tê wateya ku li gel wê ne pirsgirêka kole bimîne û hêdî-hêdî were kuştin. Em nikarin bibêjin ku jin jiyan dikin, rewşa ku ew niha tê de ne gelo mirov navê jiyanê li çi bike. Zewcandina jin mirin e, zayîna zarokan mirin e, xizmetkirina mêr mirin e, çi heye ku mirov jê re bibêje jiyan. Dayîkên me di dawiya temenê xwe de vê yekê kêlî bi kêlî hîs dikin. Hîs dikin ku emrê wan tejî derbas nebûye, mirina fîzîkî jî ji xwe re rehme dibînin. Ew hîna saxin dojehê hîs dikin û êşa wê dikşîn in. Bê hedef sax mayîn ti fêde nade jinê, ew bimre dibe ku jêre baştir be, ji ber ew di milê ruhî ve kêlî bi kêlî tê kuştin. Ne tenê insanê kole heyanî hestiyê xwe îxanetê hîs dike, hemû jin vê îxanetê hîs dikin û wê bi xwe re dibin qebra xwe.

Li Rojhilata Navîn û giştî cîhanê buyîna jin a qurbaniya şer pirsgirêkeke mezin e. Ev yek jinê lawaz û biçûk dixîne. Jina têkoşînvan çiqasî were işkencekirin, girtin û kuştin ew nabe qurbana sîstem û dewletên desthilatdar. Ew berî her tiştî rûmeta xwe diparêze, têkoşîna jiyanê dike, hebûna wê heye, lêgera heqîqetê ye û azadiya xwe dixwaz e, ev jiyane û tişta jê re tê gotin sosyalîzm.

Jina Kurd ji destpêka avakirina Tevgera Azadiyê û heyanî roja îro têkoşîna azadî û sosyalîzmê dike. Di asta pêşengtiya şerê çekdarî de berpirsyartî rakir, li hemberî sîstemên desthilatdarî li ber xwe didin, civaka zayendperest mecbûr maye ku nêrandinên xwe li ser jinê bide guhertin. Jin eşkere û ne veşartî lêgera heqîqetê dikin, sîstema baviksalarî rexne dikin, xwe birêxistin dikin, bi gelek rêbazan parastina jin dikin û wê perwerde dikin. Ev hemû rêbazên têkoşînê ne û meşa ber bi azadî û sosyalîzmê ye.



# Çend gotin li ser wêjeyê (1)

**Cîger EFRÎNÎ**

"Wêje çavê gerdûnê ye yê ku her tiştî dibîne û diçe heta kûrahiya derûniya mirovan." (M. Gorkî)

Her şoreşeke dîrokî li gorî bîrdoziya xwe hin armancan datîne pêş xwe û ji bo civaka ku dixwaze biafirîne wêjeyekê li gorî felsefa xwe derdixe holê. Li gelek welatan pêşîn di wêjeyê de proyotîpên civaka siberojê di wêjeyê de tên afirandin. Bi demê re ji kesên ku wan berheman dixwînin karekterek/kesayetek tê afirandin û bi wî awayî kesên ku wê şoreşê pêk bînin, an jî hîma civaka nû ya ku şoreşê daniye pêş xwe bihûnînin derdikevin holê. Ev, ne ji bo şoreşên rizgariya netewî, bi giranî ji bo şoreşên dîrokî derbasdar e. Mirov dikare wekî mînak; Şoreşa Ronesansê, Şoreşa Islamê, Şoreşa Pîşesazî, Şoreşa Oktoberê bide. Bi wan şoreşan re civakê serûbûniyek jîyan kir. Gava em bala xwe bidin berhemên di pêvajoya wan şoreşan de (beriya wan an jî piştî wan bi demeke kurt) derketine, nûbûnekê dibîne. Lê ji ber ku hemû şoreşan (hinekan di serî de, hinekan jî piştî demekê) bidestxistina dewletê wekî armanc diyar kirine, ji bilî berhemên pêşîn ên din wekî dubarekirin û teqlîd kirine yên pêşîn ma ne. Çimkî ew jî ketine çerxa desthilatdariyê û bi awayekî ketine xizmeta desthilatdariyê. Ango desthilatdariyê ew jî wekî xwe kirine, xesandine.

Em dizanin ku, wêje hem zanebûnê bi mirov dide qezenckirin û hem jî di hêla derûnî de rê ji guhartin û veguhartina kes re vedike.

Heta niha wêje bi gelemperî wekî ji hêlekê ve birqandin û bandora hemû hebûn û bûyerên dervayî mirov li ser derûnî û heyîna mirov girtine dest, ji hêla din ve jî tişta ku divê bê jînkirin û gengaz e raber kirine. Heger em van her du aliyan bigirin dest;

1- Birqandin û bandora bûyerên dervayî mirov li ser derûnî û heyîna mirov; Mirov hebûneke ku kesayeta wî/wê li gorî tevger û bûyerên li derdora wî/wê diqewimin û xwezaya ku têde dijî tê avakirin û awaya jîyana wî/wê jî tê dîyarkirin. Yanê wekî ku Îbnî Xeldûn gotî; "xwezaya ku mirov têde dijî çarenûsa mirov diyar dike." Lê ji nirxandinên Rêber APO em fêm dikin ku, ne bi tenê ev bandorker in. Ango ne bi tenê bûyerên ku di serdema ku kes têde jiyaye li ser bûyîn-hebûn û awaya fikirîn, xeyalkirin û jîyana mirvo bandorkerin, di gel wan hemû bûyerên ku di dîroka wê civakê de û li ser wê erdnigariyê qewimîne jî di avakirina kesayetê de xwedî ristekî pir mezin in. Gelek bûyer û qewimîn hene ku, mirov ji "bîr kirine", an jî nekesî jê re qala wan kirî û ne jî di pirtûkekê de xwendiye, lê di bingehê de ew bûyer nehatine jibîrkirin û di bîrdanka civakî de cîhê xwe girtine û ji civakê jî derbasî kes bûne. Lê ji ber ku kesên di civakê de bi debara jiyana rojane ve mijûl dibin, dibêjin qey ew bûyer hatine jibîrkirin. (divê em ji bîr nekin ku, mijûlbûna bi debara jiyana rojane ve koletiya kes kûr û xurt dike). Qet ne di ferqa wê yekê de ne ku di hebûn û awayê bûyîna wî/wê de ji zû ve cihê xwe girtine û ew kes dervayî vîna xwe di bin bandora wan bûyeran de jiyana xwe didomîn e. Ev e, di vê xalê de rista wêjeyê derdikeve holê. Dîrokzan di pirtûkên ku dinivisînin de bûyera wekî ku hatine jiyankirin dinivisînin (mixabin heta niha dîrok li gorî nêçîrvan hatine nivisandin, ne li gorî heqîqeta civakî û heta bi gelemperî di pirtûkên dîrokê de ji ber ku bi awayekî objektîf nehatine nivisandin, em di wan de gel civakê nabînin). Ji ber ku ew pirtûkên li ser mijarên dîrokê hatine nivisandin aliyê wan yê giyanî, hîs tune ye, ango ji dilînan şûştî têne nivîsandin. Ji lewra jî di avakirina kesayetê de zêde bandora wan çênabe.

Wêjevan jî bûyerên dîrokî di helbest û destanên xwe de dihûne, di çîrok û romanan de dinivisîne, lê tenê bi nivîsandina wan bûyeran re sînordar namîne. Gava tenê bi vegotina bûyeran re sînordar ma, ew berhem nabe berhemeke wêjeyî, dibe pirtûkeke li ser dîrokê hatiye nivîandin, an jî tiştekî din. Weke mînak; dîrokzan bûyereke qirkirinê dinivisîne; dibêje; "li filan cihî, di filan dîrokê de filan dewletê/keyî ewqasa kes kuştin". Ev, heta bi cihekî li ser derûniya mirov bandor dike. Lê wêjevan bandora wê qirkirinê di şexsê çend kesan de na, çiqasa li ser civakê bandor kirî vedibêje. Mînak; teswîrkirina giriyê dayîkekê, mêrekî, an jî zarokên sêwî li ber dîwaran ma ne, bêçaretiya mirovan di nava wî şerî de, dilîneke wiha ku sibehê dibe ku were serê xwîner bi awayekî nerasterast radixe ber çavan. Nêzîkatiya pêşîn bêdilîn e, ya duyemîn jî bi dilînan dagirtiye. Ev herdu nêzîkatî jî rast in, lê tam nebûne bersiv ji guherîn û veguhartinên di civakê de. Sedema vê yekê, wekî ku me li jor jî anîbû ziman, nederketina wêjeyê dervayî çembera feraseta bîrdoziya dewletê ye. Mirov dikare bêje ku, hişmendî, xeyal û daxwazên kes ji jiyanê çi bin, berhema ku binivisîne jî kêm-zêde rastiya wî/wê nivîskarê/î radixe ber çavan.



Heger em pirseke wiha bipirsin, wê merama me baştir were zelal kirin; di wêjeya heta îro de rewşa jinê çi ye? Mînak çi cudahî di navbera rewşa jinan a pêvajoya Şoreşa Pîşesaziyê û ya jinan di pêvajoya Şoreşa Oktoberê de heye? Her wiha di nêzîkbûna ekolojîk de çi cudahî di navbera nêzîkbûnên wan her du şoreşan de hene? Di hêla nêzîkbûna ol û bawrerîiyan, kêmnetewan de ferqa wêjeya wan şoreşan di hêla cewher de ji hev û din çi ye?

Di rastiyê de di hêla cewher de cudabûneke mezin mirov nabîne. Heger em mijara jinê bigirin dest; jin an objeyeke seksê ye ji bo mêr, an jî jin ji jinbûna xwe derketî û bûye mêr! Hezkirina hatiye raberkirin, li ser bingeha seksê ye. Di hinan de (yên xwe dispêrin biîrdoziyên olî) jin bi kincan hatiye pêçan, di hinan de jî (yên serdema Ronesansê û piştî wê) jin hatiye tazîkirin. Di her du rewşan de jî rista ku dane jinan heman e; an karxaneya çêkirina zarokan, an jî têrkirina ajoyên mêran e! Di her du nêzîkatiyan de jî jin bi nav heye, lê di cewher de jin bi xwe tune ye. Fîzîkî heye, lê ji hêla giyanî ve hatiye fetisandin-kuştin!

2- Rast e, di berhemên wêjeyî de tîp, karekter hatine û tên raberkirin, derûnîiya leheng vegotine, bandora civakê li ser kes jî heta astekê hatiye vegotin, lê kesayet mijareke serbixwe ye û ev alî kêm ma ye. Ango mijara kesayetê bi serê xwe bûyereke kûr û pêdivî bi vehûnandina kesayetê kêlî bi kêlî heye (di vir de qesta me ji gotina "pêdivî bi vehûnandina kesayetê kêlî bi kilî heye," ew e ku, pêvajoyên ku kesayet têde cewher standî ye. Ne ku hemû xwarin-vexwarinên kes, rabûn û rûniştandina wî/wê were vegotin e!). Heger kesayeta berê neyê veçirandin, kesayeta nû jî nawelide. Hin berhemên ku derûniya mirov digirin dest jî hene. Lê mirov heyîneke wisa ye ku, bi tenê bi veçirandina derûniyê nayê naskirin û kesayet nayê çêkirin. Ji ber ku kesayet û derûnî ne heman tişt in. Derûnî dinyaya hûndirîn e, lê kesayet kelijîna dinyaya hundirîn û ya derve ye. Weke mînak; dayîk çîrokekê ji zaroka xwe re vedibêje. Belkî ne zarok û ne jî dayîk tam di wê zanebûnê de ne ku, ew çîrok derûniyekê di hundirê zarok de çê dike. An jî guhdarkirina straneke bi coşê dagirtî, an jî bi êş û elemê dagirtî, her yek ji wan derûniyeke cuda çêdike. Her wiha zanista ku zarok di salên dibistanê de fêr dibe, baweriya olî ya ku ji dê û bavê xwe girtî û hwd. çi û çawa li ser wê/wî zarokî/ê kirî neyê veçirandin, neyê vegotin, di encamê de bandora ku li ser xwîner bike demkî ye û rê ji avakirin û sazbûna kesayeteke nû re venake.

Ji bo ku berhemên wêjeyî bibin bersiv ji civaka siberojê re, divê her tişta ku li ser hebûn û bûyîna kes bandorkere; ev mijarên dîrokê dibin, xweza dibe, têkliyên di navbera mirovan de dibin, qewimînin di derûniya kes bi xwe de çê dibin, xeyal, zanebûna kes, bawerî, zayenda wî/wê dibe, cihê wî/wê di nava civakê de, bi kurtasî strandina duh, îro û sibeha kes di kêliyê de dikare bibe bersiv ji avakirina kesayeta siberojê re. Ji hêla din ve her bûyerek li ser her mirovî di heman astê de bandor nake. Çawa ku bandora bûyrekê li ser hemû mêran ne yek e, bandora wê bûyerê li ser hemû jinan jî ne yek e. Bandora bûyerekê li ser hemû mêran cuda ye, li ser hemû jinan jî cuda ye û roletîfî ye.

Ango mijarên ku dîrokzan digire dest tiştên ku qewimîne û di encamê de bûyereke hatiye jiyankirin e. Lê wêjevan ji her bûyereke qewimiye hin aliyan hildibijêre û tevahiya bûyeran di çerçoveyekê de bi hev ve girê dide û tiştên ku neqewimîne û dibêtiya qewimîna wan heye lê zêde dike, bi tenê aliyê dilînan nagire dest, her wiha di hêla aqil de çi bandorê li ser awayê ponijandina mirov dike jî bi awayekî sergirtî dihûne û wan hemûyan bi rêbazeke ku kes xwe têde bibîne, an jî dûrî xwe bibîne raber dike. Ji xwe berhemeke wêjeyî ku mirov nede ponijandin, pirsekê di hişê kes de çêneke û mirov kêm-zêde nexe lêpirsînekê ew nabe berhemeke wêjeyî.

## Têbînî



### Pêşbirkên wêjeyî hene lê çanda pêşbirkê tune ye

**Kemal Necim**

Pêşbirkên wêjeyî ji bo afirînerî û jêhatîbûna di nivîsandina wêjeyî de têvedaneke xurt pêk tîne û dibe sedema pêşketina civata wêjeyî bi giştî. Pêşbirkên wêjeyî balê dikşîne ser berhema wêjeyî û derfetê dide ku ew berhem bêhtir were xwendin, ev jî dihêle ku ezmûna nivîskar di warê pêşdebirina nivîsa xwe de bihêztir bibe û li ser karê xwe bixebite da ku xelatan werbigire. Yek ji armanca pêşbirkan jî danasîna berhemê ye û bilindkirina nirxa wê ya wêjeyî ye. Me ev bîr û boçûnên li jor berî salekî jî di gotarekê de nivîsîbûn, lê ji ber hin rûdanên ku van rojên dawî de di qada wêjeyî de çêbûn, diviyabû careke din ew mijara were bibîrxistin. Li Rojavayê Kurdistanê ji bo geşkirin û pêşxistina qada danîn û nivîsînê salane gelek pêşbirkên wêjeyî yên di warên cuda yên wêjeyê de têne lidarxistin. Yek ji wan Pêşbirka ku di çarçoveya Festîvla Çîrokên Kurdî de tê lidarxitin e, ev festîval û pêşbirk ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyeyê û serperştiya Desteya Çandê ya kantona Cizîrê tê lidarxitin.

Li gorî rûdanên asayî girînge beşdarbûn û tevlîbûna van çalakiyan û pêşbirkan her sal ji sala din bêhtir be. Lê tişta ku xuyan dike ne wiha ye. Di sala 2024`an 39 çîroknivîs beşdarî pêşbirkê û festîvalê bûn, her wiha di rojên çalakiyê de hijmareke mezin rewşenbîr û nivîskar beşdar dibûn. Di festîval û pêşbirka îsal de tenê 20 çîroknivîs beşdar bûn û di rojên çalakiyan de jî hijmara beşdaran pir kêm bûn.

Lê çima wiha bû?

Ji ber ku piraniya nivîskarên ku sala borî beşdar bûn û çîrokên wan di pêşbirkê de bi ber neketin, ji festîvalê û pêşbirkê û yekîtiyê û ji dinyayê xeyidîn û êdî biryar dan ku careke din beşdarî pêşbirkê nebin û li çalakiyan jî amade nebin.

Ango li gorî vê reftar û helwest û rûdanê, dê sala bê hijmara kesên ku beşdar bibin wê bibe 10 kes yan kêmtir jî. Îsal jî piştî ku festîval bi dawî bû û encamên pêşbirkê hatin eşkerekirin, dîse pir kes xeyidîn û li ser profîlên xwe yên medyaya civakî, ne rexne lê şerê festîvalê û pêşbirkê û sazyên rewşenbîrî kirin. Bê guman pir girîng e ku aliyên van çalakiyan li dar dixin guh bidin rexne û têbîniyên beşdaran û rewşenbîran, divê bernameyên tekûz deynin, komîteyên nirxandinê ji nava kesên pispor hilbijêrin. Lê ya herî girîng ew e ku nivîskar û rewşenbîr jî wateya têgîn û peyva (pêşbirkê) nas bikin û di hundirê xwe de xwediyê wê hêz û baweriyê bin ku dibe bi ser bikevin yan bi ser nekevin. Divê beşdariya wan bib egera lixwevegerê û pêşxistina şiyan û karîna xwe ya derbirîn û afrêneriyê. Divê çanda rikberiya durist û pak hebe. Divê zanbin ku navê çalakiyê pêşbirk e û di encamê de dê ji nava 40 yan 20 berheman tenê 3 bêne xelatkirin, ew ê ku bi ser neketin ne tiştên xerab in yan bikêr nayên, lê yên baştir hebûn ku xelatê werbigirin. Her çiqasî wê sal bi sal dê çalakî û pêşbirkên wêjeyê bêhtir bibin, divê li gorî wê jî çanda rikberî û pêşbirkê jî pêş bikve. Eger wiha nebe dê piştî çend salan hemû dahêner û nivîskar xeyidî bin.

# Mezopotamya kevnareya dewlemendiya jiyana mirovahiyê ye

**Mezopotamya di dilê Rojhilata Navîn de cih digire. Cihê wê yê erdnîgarî di navbera du çemên mezin Dîcle û Firatê de ye, ji ber axa bi bereket, peydakirina avê ya pêbawer û avhewaya xweş ji bo çandiniyê, geşbûna şaristaniyên destpêkê hêsan kir. Herwiha Mezopotamya di teşekirina dîrok, aborî û çandê de rolek bingehîn lîstiye.**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Kurd xwedî dewlemendiyekî çandî ya gelek mezin in. Lê ew dewlemendiya çandî ji nivîskî zêdetir devikî û jiyanî ye. Ango ew dewlemendî parçeyekî jiyanê bixwe ye. Ji edebiyat û wêje bigre heta dîrokê, hemû jiyanî ye û şêwazê bilêvkirina wê jî, ji nivîskî bêhtir devkî ye. Derfetên ku kurd bikaribin dîroka xwe binivsînin û li gor berjewendiyên xwe pênase bikin pir kêmbûn. Ji ber wê jî derbarê dîroka kurdan de piranî dagirkeran nivîsandine û ji ber ku dagirkeran jî nivîsandiye berdewam kurd li gor berjewendiyên xwe pênase kirine û gelek caran jî, ji ber bi dilê xwe nekarîne desthilatdariyê li ser kurd û Kurdistanê bicîh bînin, Kurdistan wekî welatekî pir xweşik, lê mar û dûpişkan, kurd jî wek gel miletekî hov û dûr ji şaristaniyetê pênase kirine. Lê di rastiyê de Mezopotamya yan jî Kurdistan çavkaniya hemû şaristaniyetên mirovahiyê ye.




### Mezopotamya avakirina Şoreşa neolîtîkê ye

Kurdistan yekem cihê niştecîhbûn, gundvanî, kedîkirina sewalan û yekem cihê çandinî lê hatiye kirin. Heta niha ji Kurdistanê kevintir tu şûnware derneketiye. Herwiha bi derbasbûna jiyana niştecîhî, kedîkirina sewal û çandiniyê ve hemû çand û ferhenga jiyana mirov diguhere û ew yek li Mezopotamyayê ango li Kurdistanê herî kêm nêzîkî 15 hezar salan û vir de berdewam hebûye. Li hember dîroka şaristaniyeta Kurdistanê ya kevnar, di roja me ya îro de welatên herî xwe wek şaristaniyetên pêşketî ya cîhanê pênase dikin, gelek ji wan xwedî 3 an 4 hezar sal dîrokekî kevnar nîn in. Mirovahî yekem car tenê niştecîhbûnê ji Mezopotamya û Kurdistanê fêrnebûye, lê li gel niştecîhbûnê di fikra mirov de jî guhertinên mezin çêbûne, hemû jiyana mirov guheriye. Di heman demê de baweriyên mirov de guhertin çêbûne, mîna ji wêje û edebiyatê bigre, heta muzîk, huner, aborî, rêveberî û hwd… di hemû warên jiyanê de serûbinbûneke mezin di jiyana mirov de pêkhatiye û ji ber wê jî bi awayekî zanistî ew serdem wekî “Şoreşa Neolîtîk” tê pênase kirin.

### Bi şoreşa neolîtîk mirov derbasî qonaxa pêşketinê bû

Bi şoreşa neolîtîk ve mirov geheşt ew form û dîzayna civakî ya roja me ya îro ya niştecîhbûnê. Berî Şoreşa Neolîtîk ji civakîbûna mirov zêdetir civatbûn heye ku wekî klan an jî komên mirov ên gerok û ne niştecîh hene. Hemû enerjî û hêza mirov a heyî tenê ji bo dîtina nanê rojê, an jî nêçîra rojê tê serfkirin. Ji ber wê jî çanda heyî çanda nêçîrvanî ya gerok û neniştecîhî ye. Ev jî di hizra mirov de guhertin û pêşketinekî mezin nikare di kultur û çanda mirov de çêbibe. Mirovahî demekî dirêj bi vî awayî jiyan kiriye. Li gor zanist dibêjin ji dema neolîtîk heta roja me ya îro, hemû ew jiyana şaristanî ya mirov a niştecîhî, di temenê mirov de tenê xwedî rêjeya sedî 2 ye. Ango sedî 98 jiyana mirov derveyî şaristaniyeta niştecîh derbasbûye. Lê bi Şoreşa Neolîtîkê ve hemû pîvanên jiyana mirov guherîn û mirovahî derbasî qonaxeke din bû.

Civaka kurd ew taybetmendiyên civakbûna neolîtîk heta roja me ya îro jî di xwe de digre, ji çîrok û wêjeya devkî bigre heta dengbêjiya wê, hemû mirov dikare bibêje bermayên wê çandê ne. Gelek çîrok hene li Kurdistanê çavkaniya xwe heta digere dema neolîtîkê. Ew çîrok an jî mîtolojî û wêjeya devkî şêwazê fikir û hizirandina dema xwe ye.

### Şarestaniya ku dihat veşartin ji bin erdê derdikeve

Şaristaniyetên piştî Mezopotamya Jorîn dema dadikeve Mezopotamya Jêrîn gav bi gav bi awayê nivîsa bizmarî ve vedigerin wêjeya nivîskî. Li gel hemû hewldanên windakirina dîroka kurd û Kurdistanê jî, çavkaniyên bingehîn yên civaka kurd û şêwazê jiyana civaka kurd di derbarê dîroka wê de jî hemû agahiyan dide. Bi taybet wêje û edebiyata devkî bigre heta dengbêjiyê bi temamî dîrok û şêwazê jiyana kurd û Kurdistanê radixe ber çavan. Lê ji aliyê din ve her ciheke Kurdistanê dema ku tê kolan jî mirov dibîne ku ji bin erdê şaristaniyet difore. Ango şaristaniyeta ku tê veşartin ji bin erdê derdikeve. Dibe ku mirovahî li hember wê şaristaniyetê çavê xwe bigre, piştguh bike û nexwaze wan rastiyan bibîne, lê rastiya mezinatiya çandî ya civaka kurd nayê windakirin. Heger çand û şêwaza jiyanê ya li Kurdistanê ewqas bihêz neba, li hember ewqas hewldanên bişaftin û tinekirinê nedikarî xwe li ser piyan ragire. Gelek çand û netewên ku li ser vê erdnîgariyê ne xwedî çandeke bihêz bûn, lewra ew hatin tunekirin. Lê kurd her man û dê her bimînin.

### Mezopotamya Antîk

Mezopotamyaya Kevnare, dergûşa şaristaniyê, tepsiyeke balkêş a ecêbên kevnar û mîrateyên domdar derdixe holê. Mezopotamya, ku di dilê Rojhilata Navîn de cih digire, ji Kendava Farisî ya li Başûr heta qûntarên Çiyayên Torosê yên li Bakur dirêj dibe. Cihê wê yê erdnîgarî di navbera du çemên mezin, Dîcle û Firatê de ye, ji ber axa bi bereket, peydakirina avê ya pêbawer û avhewaya xweş ji bo çandiniyê, geşbûna şaristaniyên destpêkê hêsan kir. Girîngiya vê herêmê di kevnariyê de nayê zêdekirin, ji ber ku ew bû qonaxek ji bo derketina bajar-dewletan, pêşkeftina pêkhateyên hukûmetê yên tevlihev û jidayikbûna mîmariya abîdeya wekî zigguratan. Mîrateya Mezopotamyayê bi bandora xwe ya kûr a li ser şaristaniya mirovatiyê, zemîna çandên paşerojê datîne û bandorê li pêvajoya dîrokê ya hezarsalan dike.

### Dîroka Mezopotamyaya Kevnar

Mezopotamyaya kevnar xwedan dîrokek dirêj e, li dora 3500 BZ dest pê dike dema ku yekem bajardewletên Sumeran li seranserê Başûrê Mezopotamya dest pê kir. Van bajaran yekem bûn,û yek ji wan nivîsên pêşîn (cuneiform), hukûmet û ol danîn. Paşê, dora 2350'î BZ, Sargonê Akad Mezopotamya kir yek û împaratoriya yekem a cîhanê ava kir. Şaristaniya Babîlî ya Hammurabî ku bi koda xweya qanûnî ya navdar tê zanîn, li dora sala 1792'an BZ pêş ket. Di dirêjahiya dîroka xwe de, Mezopotamya dît ku împaratoriyên cuda yên mîna Asûrî, Nû-Babîlonî û Farisan hatin û çûn. Tevî dagirkeran, ew navendek çand û fêrbûnê ma, digel pêşkeftinên girîng ên matematîkî, astronomî û wêjeyê li Mezopotamya kevnar.

birdûya Mezopotamyayê bi bûyer û guhertinên mezin dagirtî ye. Piştî ku Împaratoriya Babîl di sala 539'an BZ de ket, ew kete bin desthilatdariya Farisan, îstîqrar û mezinbûn anî. Serdestiya Îskenderê Makedonî di sedsala 4'an BZ de bandora Yewnaniyan anî û pişt re jî Împaratoriyên Partî û Sasaniyan çanda Îranê ji nû ve zindî kir. Piştre di sedsala 7'an a P.Z de, ereb fetih destnîşan kirin îslamiyet li herêmê, ziman, ol û awayê jiyana wê diguhere.

### Împaratoriyên Mezopotamyayê

Mezopotamyaya kevnar şahidê bilindbûn û hilweşîna gelek împaratoriyên bi hêz di nava hezar salan de bû. Împaratoriya herî kevn a naskirî ya li herêmê Împaratoriya Akadî bû ku ji aliyê Sargon Akkadî ve di derdora sala 2350 BZ hate damezrandin ku yekem mînaka yekbûna siyasî li seranserê Mezopotamyayê nîşan dide. Piştî Akadiyan, Împaratoriya Babîlonî derket hole. Ev împaratorî di bin serweriya Hammurabî de di derdora 1792'an BZ de digihîje zenîna xwe ku bi komek qanûnên xwe yên kodkirî yên ku wekî Qanûna Hammurabî tê zanîn navdar e. Vê serdemê di rêveberî, pêşkeftina bajarî û destkeftiyên çandî de pêşkeftinên girîng dîtin. Piştre împaratoriya Asûrî li dora sala 900 BZ bilind bû, bi êrişên leşkerî ve bi tundî berfireh bû û yek ji mezintirîn împaratoriyên cîhana kevnar ava kir. Împaratoriya Neo-Babilonî, bi rêberiya Nebuchadnezzar II, li dora 626 rabû ser desthilatdariyê, avahiyên berbiçav ên wekî Baxçeyên Daleqandî yên navdar ên Babîlê ava kir.

Di sala 539 BZ de, Mezopotamya di bin desthilatdariya Împaratoriya Persan de piştî dagirkirina Kûrosê Mezin, dest bi serdemek serdestiya Farisan û danûstendina çandî li herêmê kir. Her împaratoriya ku li ser Mezopotamyaya kevnar desthilatdar bû, mîrasek mayînde hişt, dîroka xwe ava kir û bandor li şaristaniyên paşerojê kir.

### Mezopotamya kevnareya dewlemendiya jiyana mirovahiyê ye

Mezopotamyaya kevnare bi taybetmendiyên xwe yên erdnîgarî yên yekta, di serî de deştên bi bereket ên ku di navbera çemên Dîcle û Firatê de ne, bi guncav navê “erdê di navbera çeman” de ye, dihate naskirin. ji bo avdanî û veguheztinê peyda dike û di dema lehiyên demsalî de axên dewlemend ên xurdemeniyê vedihewîne ku hilberîna çandiniyê ya zêde hêsan dike. Vê dîmena bi bereket piştgirî da mezinbûna gelek bajardewlet û şaristaniyan, pêşkeftina teknîkên çandiniyê yên pêşkeftî yên wekî pergalên avdaniyê û zivirîna çandiniyê.

Ji derveyî çeman Mezopotamyayê dîmenên cihêreng dihewand, di nav de deşt, çol û herêmên çiyayî. Parçeya başûrê Mezopotamyayê ku bi navê Sumer tê zanîn, li nêzî Kendava Farisî deverên bi çolê vedihewîne. Ew ji hêla civakên masîgiran ve tê de dijîn û wekî astengên xwezayî li dijî dagirkeran bûne.

Li herêmên Bakur jî, yên wekî Asûr û Babîl, ji deştên ziwa û çiyayên asê pêk dihatin ku ji bo parastin û derxistina çavkaniyan avantajên stratejîk pêşkêş dikin. Tevî dîmenên wê yên cihêreng, taybetmendiyên erdnîgarî yên Mezopotamyayê di teşekirina dîrok, aborî û çanda wê de rolek bingehîn lîstin û ew kirin yek ji herêmên herî bibandor di cîhana kevnar de.

### Mezopotamya li dor gelek çandên pirxwedayî vehewiya

Ol di çanda kevnar a Mezopotamya de, bi baweriyên pirxwedayî yên li dora xwedayên mîna Enlil, Ishtar û Marduk, rolek girîng lîst. Perestgehên, bi navê ziggurat, wekî avahiyên abîdeyê ji bo rûmeta xwedayan û wekî navendên çalakiyên olî û îdarî hatine çêkirin. Mezopotamiyên kevnar di heman demê de karên hunerî yên balkêş hilberandin, di nav de morên silindir ên tevlihev ên ku ji bo bazirganî û mebestên îdarî têne bikar anîn. Herwiha mîmariya abîdeya mîna Baxçeyên Daleqandî yên Babîlê, yek ji Heft Heyranokên Cîhana Kevnar. Tevî ku bi dijwariyên wekî dagirkerî û felaketên xwezayî re rû bi rû maye jî, mîrateya çanda Mezopotamyayê bi tevkariya xwe ya ji bo şaristaniya mirovahiyê re dimîne.



# Ji dema Serxwebûnê ve sîstemên desthilatdariyê li Sûriyê û sîstema herî guncaw ji bo Sûriya îro... (3)

Di serdema Esedê bav de azadiya kesayetî û giştî hatin çewsandin, jiyana siyasî hat tunekirin û pirrengiya siyasî hatibû mandelekirin. Her tim gotina yekem û dawî ya hêza ewlekariya leşkerî û zora leşkerî bû. Herwiha aborî jihevketî bû û hemû dîmenên azadî, demokrasî, ewlekarî û ewlehiyê tune bûn. Esedê bav berî mirina xwe kurê xwe ji bo serokatîyê amade kiribû, ew jî di rûniştineke Encumena Gel de ku tê de madeyeke destûrî hat guhertin. Di wê destûrê de dihat gotin ku nabe temenê serokê dewletê kêmî çil salî be, lê di pênc xulekan de Beşar bû emîndarê Partiya Baasê û bû serokê welat û rêberê giştî yê dewlet û civakê.



### Rêbazê Esedê kur ji Esedê bav ne cûdatir bû

Rêbazê Esedê kur ji yê bav ne cûdatir bû. Piştî demeke kurt ji rêbazekî hinekî baş, aliyên ewlekarî careke din, piştî guhertinên ku li Rojhilata Navîn çêbûn, (hilweşîna rêjîma Iraqî, kuştina Refîq el-Herîrî li Libnanê û tewanbarkirina rêjîma Sûrî bi kuştina wî) dest bi çewsandina dijberan li welat kir.

Tevî ku madeya destûrî ya ku dibêje “Partiya Baasê serwera dewlet û civakê ye” hat guhertin jî, lê gelên Sûrî dê rastî rêjîmekê bimîne ku ji rêjîma Esedê bav bi gelekî dijwartir û tundtir bû. Bi gihaştina şoreşa erbî bo Sûriyê û bi şikandina tilîyên zaroyên Derayê yên ku li ser dîwarên dibistanan nivîsîn “em azadiyê dixwazin”, şoreşa Sûrî di nîvê Adara 2011'an de hat destpêkirin. Di encamê de jêrzemîna welat hat rûxandin û bi melyonan Sûrî hatin koçberkirin, bi hezaran jiyana xwe ji dest dan û bi sed hezaran di zindanên vê rêjîmê de bi cih bûn, her wekî zindana Seydnaya ya ku hovîtî û dîktatorîya rêjîma Baasê nîşan dide. Jixwe bi hezaran Sûrî heya niha windayî ne. Lîsteya komkujîyên ku derheqê Sûriyan de di vê şoreşê de pêk hatin, ne kêmî komkujîyên ku di serdema bavê wî de pêk hatine, her wekî komkujîya kîmawî ya Xûta di 21'ê tebaxa 2023'an de û komkujîya Xan Şêxûn di nîsana 2017'an de.

Tevî ku xwest hin pinekirinan di destpêka şoreşê de bike jî, lê bi yek carê rêjîma giştgir destê xwe neda Sûriyên ku doza guhertina ber bi demokrasiyê, rêzgiritina mafên mirovan û parastina azadiyan dikir. Lê belê rijdbûna rêjîma Sûrî li ser çareseriya leşkerî û dana derfetê ji bo aliyê leşkerî da ku xwepêşanderên aştiyane biçewisînin, hişt ku şoreş ber bi leşkerbûnê ve biçe û destwerdanên navdewletî û herêmê di Sûriyê de pêk werin. Di encamê de aloziya Sûrî kûrtir û aloztir bû û bêtir xwina gelê Sûrî hat rijandin û dewleta Tirk xaka Sûrî dagir kir û gelên Sûrî bêtir tarûmar bibe û ji hev bikeve.

### Bi piştgiriya Rûsî û Îranî Beşar li ser desthilatê ma

Bi piştgiriya Rûsî û Îranî ya berbiçav, Beşar di dema şoreşê de li ser desthilatê ma, lê di 8'ê Berfanbara 2024'an de, ev desthilat li ser destê HTŞ'ê (Desthilata Şamê) hat rûxandin û Beşar reviya derveyî welat. Bi vî awayî desthilata Baasê û malbata Esed ya ku bi awayekî zordar, mîratî û nijadî hukm li Sûriyê dikir, bi dawî bû û li pey xwe barekî giran li ser milê xelkên Sûriyê hişt ku vê yekê ew di tirs û nehedarîyeke mezin de hiştin. Nexasim ji ber van guhertinên siyasî yên bilez li herêmê û bidawîbûna rêkeftina Sayiks-Bîko û ji nû ve nivîsandina nexşeya herêmê, nemaze ji ber ku HTŞ'ê bi paşxane û çanda xwe ya islamî ya radîkal tu hêvîyekê ji bo Sûriyeke demokratîk hilnagire û heya vê kêliyê tu nexşeyeke çareseriyê ji bo Sûriyê û nerîneke zelal derbarê Sûriya pêşerojê û awayê desthilatê tê de, li ba wê tune ye. Heya niha hê rêbazê gihaştina wê ji bo desthilatê di demeke kurt de pirsan tîne holê û derbarê hêza saloxgerî ya li piştê gumana hene.

### Qonaxa guhertina dîrokî ya mezin

Qonaxa guhertina dîrokî ya mezin di nava xwe de du bijarteyan tenê dihewîne; qonaxeke xwînî ya mezintir (eger ev qonax mîna rêbazê dewleta neteweyî, alav û rêbazên wê be), wê hingê dê parçekirina Sûriyê encama dawî ya vê qonaxê be (eger li ser dewleta neteweyî û navendî ya xwedî yek al, yek ol, yek reng û yek netewe hat rijdman).

Ji aliyekî din ve ev qonaxa herî berhemdar e. ji ber wê jî gelê Sûrî li pêşberî mafên dîrokî ye, da ku xwestekên civaka Sûrî ya pir ol, pir nasnameyên çandî, nijadî û neteweyî werin pêkanîn. Ji ber wê jî bihêzkirina enîya hundirîn li Sûriyê peywireke sereke ye û yek ji erkên girîng û sereke ye ku dikevin ser milê tevahî partî, aliyên siyasî û kesayetên siyasî, çandî û olî yên ku baweriyê bi demokrasî, pirrengî, azadî û aştiyê tînîn. Ji wan tê xwestin ku têkoşîna xwe zêdetir bikin. Da ku pergaleke nû li Sûriya nû were avakirin ku tê de azadiya civaka Sûrî, wekhevî û rêveberîyeke demokratîk û pirreng werin dabînkirin û ji nû ve reseniya civaka Sûrî were vejandin; ew jî bi rêya xwespartina li nirxên civakî û sincî yên ku hemû pêkhateyên gelê Sûrî ji sedên salan ve digihînin hev û divê hemû li ser Sûriya nû li hev bikin, Sûriyeke ku gel û xaka wê yekgirtî be, Sûriyeke ku xwedî nasnameyeke niştîmanî ya ji bo hemû Sûriyan be.

**Navenda Rojava Ya Lêkolînên Stratejîk**

# ‘Demokratîkbûna Sûriyê rêya derketina ji qeyranê ye’

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Bi hilweşîna rêjîma Baas a qirker re hikumeta Şamê ya veguhêz hate ser desthilatdariya Şamê, tu guhertin çênekir, lê tundî û kuştin zêde bû. Xelasbûna Sûriyê ji vê tundî û qirkirinê, bi demokrasî û biratiya gelan e.**

Rêjîma Baas ku 67 salan li ser desthilatdariya hikumeta Sûriyê ma û ev 67 sal bi êş, komkujî, qetilkirin, neqebûlkirina gelan û talankirinê tîjî bû, piştre di 8'ê Berfambara 2024'an de Rêjîma Baas tê hilweşandi, li şûna wê hikumeta Şamê ya veguhêz tê avakirin, tu guhertin nehat çêkirin, lê rewşa Sûriyê her ku çû aloztir bû. Kuştin, talankirin, revandina jinan û tundî zêde bû, çareseriya aloziya Sûriyê çiye? Ji bo pêşeroja Sûriyê û demokrasiyê pêwîste ku di nava xwe de hemû netew, ol û gelan bigre. Divê di avabûna Sûriyeke nû de azadî, wekhevî û qebûlkirina jinê esas be û pêwîste ku sîstema navendî û qirkirinê bidawî bibe û sîstema demokrasî û azadiyê were avakirin.

### Rêjima Baas

Sûriyê û Rejîma Baas her tim di nava aloziyek mezin de jiyan dikir, hertim kuştin, neqebûlkirina gelan, qirkirin û komkujiyên li ser netewên din dihate meşandin. Di dema Rêjîma Baas de hemû gel û netew rastî gef, revandin û neqebûlkirinê dihatin, ji ber Rêjîma Esed Sûriyê di nava alozî, pirsgirêk û tunebûnê de jiyan dikir. Rêjîma Esed ku 67 salan di hikumetê de ma, ew 67 sal ji bo tevahî gelê Sûriyê salên tunebûna maf û jiyanê bû. Di heman demê de neqebûlkirina gelan û bi taybet gelê kurd, herdem gelê Kurd di nava êş û komkujiyan de jiyan dikir. Rêjima Baas gelê kurd ji nasnameya wan ya Kudî dûrxistin û qedexe kirin û derfet nedihişt ku bi Kurdî biaxive û bixwîn e. Gelek herêmên Kurdan dagirdikin, kurdên ku ji bo gelê Kurd kar û xebat bike ew dikirin zindanan, şehîd dixistin û hemû kiryarên dijmirovî li ser gelê Kurd didane meşandin.

### Bi hatina hikumeta Şamê ya veguhêz re, çi guhertin rûda?

Bi hatina hikumta Şamê ya veguhêz re, rewşa sûriyê alûztirbû. Sûriyê hîn di nava şer, kuştin, qirkirin û gefê de jiyan dike. Gelê Sûriyê hîn rastî qirkirin û kuştinê tê, gelê Elewî û Durzî yê ku hikumeta Şamê di bin navê ku ew bermahiyên Rêjîmê ne êrîşî wan dike û gelek kes li Berava Sûriyê rastî kuştin, işkenceyê tên û gelek welatî jî rojane têne revandin. Di serî de kiryarên ku li ser jinê têne meşandin bê sînor û hesabin; jin dihatin revandin û aqûbeta wan çiye kes nizane, zarok hatin kuştin. Sûcê van zarokan çiye qey ew jî bermahiyên Rêjîmê ne, an wan sûriyê xerab kiriye? Sûriyê ji pêvajoyek xerab derbasî pêvajoyek xerabtir bûye, guhertin nîne. Sûriyê di çarçoveya alozî û mirinê de maye. Her roj komkojî, qirkirin, kuştin û revandin heye. Gelek hevdîtin di navbera hikumeta Şamê û QSD'ê de hatin çêkirin, li ser hin bendan li hevkirin çêbû, lê hin bend pêkhatin û hin jî hîn pêknehatine.

### Pêşeroja jinê di nava hikûmeta demikî ya veguhêz de wê çawa be?

Di nava HTŞ'ê de ne qebûlkirina jinê heya, niha heye herwiha jin tên revandin û rewşa wan ne diyar e. Di nava Sûriyeke aloz de wê rewşa jin çawa be? Jiyana jin wê hertim di nava sînor û tirsa ji revandina bi darê zorê be, ser serî û çav girtin bi darê zorê di bin navê şermê de. Neqebûlkirina mafê jinê ne qebûlkirina civakê bi gîştî ye. Divê rol û mafê jinê were parastin.




### ji bo pêşeroja Sûriyê çi sîstem û netew pêwîste?

Ji bo pêşeroja Sûriyê demokrasî pêwîst e, Ji bilî demokratîkbûna Sûriyê rêyeke din ya derketina ji qeyran û aloziyê tune ye. Sûriyê di gelek alozî, komkojî û qeyranan re derbas bûye, ji bilî demokrasiyê tu çare tuneye. Sistema demukrasiyê wê mafê hemû gelê Sûriyê biparêz e, hemû netew û olan di nava xwe de qebûl bike. Di nava Sûriya pêşerojê de pêwîste mafê gelê kurd, Elewî û Durzî were parastin, ji ber ku ev gel rastî gelek êş û binpêkirinan hatine. Herwiha ya herî girîng mafê jin were parastin, jin di pêşeroja Sûriyê de xwedî cih û biryar be. Kesê ku destdirêjî li ser jinê kirine werin cezakirin, çeteyên ku di nava hikumeta Şamê de weke fermandar hatine erkdarkirin û destê wan di şehîdxistina jinan de heye werin cezakirin û ji erkê wan dûr bixin. Pêşeroja Sûriyê divê li ser esasê demokrasî, azadî û hevjiyana azad be, ne koletî, kuştin û zayendperestî be.

# ‘Ez jî dixwazim bi Rêber Apo re hevdîtinê pêk bînim’

Bi armanca ku zext li dewleta Tirk bê kirin da ku bi cidî tevlî pêngava aştiyê bibe di 14'ê Gulanê de kampaniya gerdûnî bi dirûşmeya “Ez jî dixwazim bi Rêber Apo re hevdîtinê pêk bînim' hatibû destpêkirin û di asteke bilind de berdewam e.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di nava geşdan û pêşketinên siyasî ku tevahî cçhan tê de derbad dibe, ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve pêvajoya ‘Banga Aştî û Civaka Demokratîk’ di dîrokî 27’ê Sibata îsal hat ragihandin, ev pêvajo ji bo çareseriya pirsgirêka Rohilata Navîn, doza gelê Kurd û Tirkiyê ye.

Di nava qonaxa sêyemîn a kampaniya “Ji Abdullah Ocalan re Azadî, ji Pirsgirêka Kurd re Çareserî” ji aliyê Platforma Aştî û Azadiyê ya Ewropayê (EFFP) ve kampaniya bi navê “Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim” bi rêya daxuyaniyekê hat destpêkirin.

Di daxuyaniya platformê de hate diyarkirin ku di çarçoveya kampanyayê de serlêdan wê ji Wezareta Edaletê ya Tirkiyê re bê kirin û daxwaza hevdîtina bi Rêber Apo re li Girtîgeha Îmraliyê bê kirin.

Di daxuyaniyê de hate tekezkirin ku ev bang ne tenê ji bo aştiyê ye, di heman demê de ji bo azadî, wekhevî, edalet û çareseriya pirsgirêka Kurd e. Herwiha ji bo ku pêvajo bi ser bikeve, divê astengiyên li pêşiya parvekirina nerîna çareseriyê ya ku Rêber Apo bi salan amade kiriye, bê rakirin.

Bang li akademîsyen, hunermend, siyasetmedar, rojnamevan, parêzvanên mafên mirovan, çalakvan û raya giştî ya navneteweyî hat kirin ku ji bo serdana Rêber Apo ya li Girtîgeha Îmraliyê bi awayekî fermî serî li Wezareta Edaletê ya Tirkiyê bidin.

Di daxuyaniyê de hat xwestin ku ji bilî serlêdanên nivîskî, divê bi çêkirina vîdeoyên kurt peyamên xwe yên li ser girîngiya van serdanan, parve bikin. Hat xwestin ku vîdeoyên ku di çarçoveya kampanyayê de werin amadekirin, di navbera 30 saniye û 2 deqeyan de bin.

**Kampaniya “Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim” berdewam e**

Kampaniya “Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim” ku Platforma Aştî û Azadiyê ya Ewropayê (EFFP) raghandibû berdewam e û her ku diçe piştgiriyeke berfireh jê re tê kirin. Ji destpêka raghandina kampaniya piştgiriyek mezin ji aliyê gelek hêzên aştî, demokrasî û hêzên çepgir-sosyalîst ên li Ewropayê tê kirin.

**Navên rêxistin û partiyên navdewletî yên ku piştgiriya kampaniya “Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim”; dikin ev in:**




Koma Çep li Perlementoya Ewropayê, Partiya Çep a Ewropayê, Enternasyonala Pêşverû ku nûnertiya gelek tevger, partî, sandîka, rêxistinên civakî çapgir, mafên mirovan, jîngehî, demokratîk û sosyalîst li serasnerî cîhanê, herwiha Yekîtiya Komeleyên Niştimanî, Civakî û Çandî (ARCI), rêxistina sereke li Îtaliya û başûrê Efrîqîayê ku di nava xwe de 5 hezar navendên çandî digre piştgiriya xwe ji bo kampaniya raghandin.

Enternasyonala Pêşverû ku di nava xwe de gelek tevgerên karkeran û çepgirên Emerîka Latînî heya başûrê Asaiya û pêkhateyên wê banga tevlîbûna vê kampaniyê kir, di heman demê de wê yekîtiyeke ji Birîtaniyayê û koma xebatên kurdî di parlementoya Ewropa û partiyên sosyalîst çepgir tevlî bibin.

Insyatîfa Îrqaî ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan jî piştgiriya xwe ji bo kampaniya “Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim” ragihand û tekez kir ku armanc jê ku zexetê li dewleta Tirk bike, da ku bi hevpeymanên navdewletî pabend be.

Însyatîfê diyarkiribû ku pêngava Rêber Abdullah Ocalan prnesîba mirovahî, fikrê azad û civaka demokratîk îfade dike, ev yek tê wateya ku xebata siyasî ne ji bo civak, netew, partî an îdyolojiyekê diyarkirî ye, lê ew fikir û rêyke demokratîk, azadî û aştiyê ye.

Heya niha gelek kampanî û pêngav ji bo azadiya fîzkî ya Rêber Abdullah Ocalan hatin kirin, kampaniya “Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim” jî yek ji wan kampnaiyên ku îradeya gel ya fikrê azad û zindîkirina wan ji nû ve, nîşan dide.

**Armanca Kampaniya**

Armanca sereke ya kampanyayê azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan e, ew e ku ev 26 sal in tecrîdeke girankirî li ser Rêber Apo tê ferzkirin û divê tevahî gel tevlî vê pêvajoya çareseriyê bibin. Ji xwe ev kampanî ne tenê kesên akademesiyên, siyasetmedar an rojnamevan tevlî dibin, lê armanc jê ku tevahî civak daxwaza serlêdana Rêber Abdullah Ocalan bikin, bi taybet ji bo kesên ku dixwazin aştî û demokrasî pêk were.

# 10’emîn salvegera komkujiya Kobanê

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Di 25’ê Pûşpera 2015’an de çeteyên DAIŞ’ê nêzî saet 4’ê sibehê de xwe berdan nav bajarê Kobanê û hin gundên wê û komkujî pêk anîn. Di encamê de 253 kesan jiyana xwe ji dest dan.**

Ev 10 sal li ser komkujiya Kobanê re derbas dibe ku xelkê Kobaniyê wê bi şeva xedirê bi nav dike û heya roja îro jî wê komkujiyê birînên kûr di dilê her malbateke Kobanî de li pişt xwe hiştiye. Bi awayekî herî hovane çeteyên DAIŞ’ê di 25’ê Pûşpera 2015’an de wê demê meha rojiyê û piştî rizgarkirina Kobanî ji destê DAIŞê bi 5 mehan bû, ku ji 100 kesî pêk dihat ji aliyê Tirkiyeyê ve êrîşî Kobanê kirin û komkujî pêk anîn. Di komkujiyê de 253 welatî hatin qetilkirin û 273 birîndar bûn.

**Çeteyên DAIŞ’ê ji aliyê sînorê Bakurê Kurdistanê ve ji du baskan ve êrîş kirin**



Çeteyên DAÎŞ’ê di 15’ê Îlona 2014”an êrîş anî ser Kobanê. Çeteyên DAÎŞ’ê piştî ku 350 gundên Kobanê dagir kir êrîş anî ser navenda bajêr. Hêzên YPG û YPJ’ê berxwedana herî mezin a dîrokî li dijî êrîşên çeteyan kirin û 26’ê Çileya 2015’an de DAÎŞ’ê derba xwe ya mezin li Kobanê xwar û ew bû destpêka têkçûna DAÎŞ’ê.

Lê ev ne tenê ji bo çeteyên DAÎŞ’ê bû derb. Her wiha ji bo dewleta Tirk ku fermandariya DAÎŞ’ê dikir jî bû têkçûneke mezin. Dihate maneya têkçûna Recep Tayyîp ku wê demê digot, ‘’Tişt nemaye ku Kobanê bikeve’’. Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê DAÎŞ ku ev têkçûn qebûl nekirin 25’ê Pûşpera 2015’an êrîş anîn ser Kobanê. Di vê êrîşê de piranî jê jin, zarok û kesên temen mezin 253 hatin kuştin, bi sedan sivîl birîndar bûn.

Çeteyên DAÎŞ’ê 25’ê Hezîrana 2015’an ji aliyê sînorê Bakurê Kurdistanê ve ji du baskan ve êrîş anîbûn. Beşek ji çeteyan ji aliyê Deriyê Sînor ê Murşîdpinarê ve beşek jê ji aliyê gundê Berxbotanê ve êrîş anîbûn.

**Çeteyan cilên YPG’ê li xwe kiribûn**

Çeteyan êrîşî sivîlên di malên xwe de kirin, ketin malên wan û her kesê ku rastî wan dihat şehîd dikirin. Li gorî gelek raporên rêxistinên mirovî, komkujiya ku ji aliyê çeteyên DAIŞ’ê ve hatiye kirin, derketiye asta qirkirinê. Rêbazên herî hovane yên serjêkirin û gulebarankirinê li dijî gelê Kobanê pêk anîn. Bi kurtasî her cure amûrên ku di asta navneteweyî de hatine qedexekirin û her cure rêbazên dermirovî yên ji aliyê çeteyên DAIŞ’ê ve hatin bikaranîn.

Hêjayî gotinê ye ku salane di vê rojê de gel û kesûkarên qurbaniyên Komkujiyê serdana goristana şehîdan dikin. Soz û peyama berdewamkirina rêbaza şehîdan nû dikin, mizgêniya rizgarî û azadiyê dighînin şehîdên komkujiyê.



## Dewlet gelan naparêzin!

**Dilyar Cizîrî**

Di demekê de li Rojhilata Navîn û cîhanê rojevên gerim têne jiyankirin, bi taybet piştî êrişên hewayî yên Îsraîlê li dijî Îranê, aloziyên heyî kûrtir dibin. Her çendî Amerîka ji rojên destpêkê ve beşekî êrişan bû, lê fermî nedigot ez jî di êrişên li dijî Îranê de cih digrim. Herî dawî Amerîka bi xwe jî êrişî Îranê kir. Ev şer û alozî xetimîna sîstema cîhanê û hêzên hegemon nîşan dide. Li Sûriyayê rewş hîn dijwartir dibe.

Li gelek cihan Komên çekdar bi rêbazên DAIŞ’ê êrişan pêk tînin. Di heman demê de bûyerên revandin, talan, dizî û sûcên wekî din li hemû herêman zêdetir dibin. Êrişa terorane ya Başûrê paytexta Sûriyê Şamê sînaryoyek din a bi xwîn li dijî gelê Sûriyayê ye. Heger em mijara demê de hinekî detayan bînin ber hev, li gorî agahiyan kesê terorîst ji Idlibê ye. Heta ji mêj ve endamê hêzên ewlekariyê yên HTŞ’ê ye. Di nêrîna min de ev ne tesadife, Hêzên çekdar ên niha li Sûriyayê serwerin û di bin sîwana hêzên heyî de, piraniya endamên wan berê di nava DAIŞ’ê de bûn. Bi wate diyar dibe, DAIŞ’ê xwe baş di nava saziyên fermî ku niha li ser navê dewletê tevdigerin, bi cih kiriye.

Komkujiya li Başûrê Şamê ku li dijî xiristyanên Sûriyayê mirov dikare beşek ji şerê di navbera Israîl û Îranê de bibîne. Gerek tu carî ji hev qut neyê destgirtin. Diyare DAIŞ’ê wê bibe alava guehrtinên bingehîn ên di hikûmeta Ehmed El-Şeri de. Di heman demê de bê aramî û sûcên rojane têne kirin, vê yekê nîşan dide. Her çendî em di van kêliyan de nûçeyên ku êdî wê şerê Îsraîlê li dijî Îranê rawerste. Ne mumkine ev şer wiha bi hêsanî raweste û bi dawî bibe.

Hemû aloziyên niha li Rojhilata Navîn niha têne jiyankirin, bi taybet li Sûriyê, her wiha êrişên Îranê yên li dijî Bargehên Amerîka li Iraq û Qeterê, bayê guhertina herêmê ye. Bingeha Şerê Cîhanê yê sêyemîn e. Di encama aloziyên heyî û guehrtinên di herêmê de ji her kesî re isbat dike ku dewlet netew nikare gelan ji êriş û komkujiyan biparêzin.

Ne hikûmeta Ehmed El-Şeri, ne jî hikûmeta Qeter li beranberî êrişê Îranê dikare gelê xwe biparêze û ne jî Îran û Tirkiyê dikarin gelê xwe ji komkujî û êrişan biparêzin. Ev ji bo tevahî welatên Rojhilata Navîn jî derbasdar e. Berûvajî em dibînin dewlet bi siyasetên xwe yên heyî li serê civakan bûye bela, komkujiyan bi serê wan de tînin. Di dema aramî û aştiyê de dewlet bi xwe gelê xwe dikuje, di demên şer û êrişan de jî gelên xwe wekî mertal ji bo parastina desthilatdariya xwe bikar tîne. Lewma pêwîste civak bi xwe hevgirtina xwe mezin bike, li dûrî bendewariya dewlet û desthilatan pirsgirêkên xwe çareser bike û parastina xwe misoger bike. Nimûneya piratîzekirî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyayê baştirîn nîşan e. Ev di serî de li Sûriyayê, Lubnan, Îsraîl, Filistîn, Îran, Tirkiyê û hemû welatên Rojhilata Navîn derbasdar e. Yan jî wê her komkujî û sûcên li dijî civakê zêdetir bibin.



# ‘Pêvajo fersendeke û divê Tirkiyê wê qezenc bike’

Endamê Desteya Dîplomasî ya PYD'ê li Ewropayê Fûad Umer da zanîn ku dewleta Tirk ji ber xeteriya li ser xwe riya pêvajo bijart, divê pêvajoyê qezenc bike û got, “Ji bo pêvajo bi ser bikeve û mafê Kurdan were parastin, Rêber Apo dixwaze bi hemû rayedarên Kurdan re bicive."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Di 27’ê Sibata 2025’an de, Rêber Abdullah Ocalan, banga “Aştî û Civaka Demokratîk” da. Nêzî 130 rojan e ku ev bang hatiye dayîn, bi dirêjahiya vê demê, kongra 12’an a PKK’ê çêbû, PKK’ê agir best ragihand û xwe fesix kir, hem jî gelek serdanên DEM Partiyê ji bo Rêber Ocalan, partiyên Kurdî û hwd… çêbûn.

Lê ji milê dewleta Tirk ve wekî tê payîn, hîna gavên berbiçav û mercên zagonî ku divabû bavêje, nehatine avêtin. Ev yek jî ji hêla gelek siyasetmedarên Kurd ve hate destnîşankirin û gotin dewleta Tirk di warê serxistina pêvajoyê de derengxistinekê çêdike.

Derbarê Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de endamê Rêveberiya Diplomasî a PYD’ê li Ewropayê, Fûad Umer ji rojnameya me re axivî.

**‘Dewleta Tirk ji ber xeteriyê pêvajo hilbijart’**

Fûad Umer anî ziman ku dewleta Tirk ji ber xeteriya li ser xwe riya pêvajoyê bijart û wiha bi lêv kir: “Di van salên dawîn de bi taybet ji sala bûrî de guhertinên gelek mezin li Rojhilata Navîn çêdibin, wekî ku tê diyarkirin wê nexşeya vê herêmê were nûkirin, Kurdistan jî di nav vê guhertinê ye. Di serî de şerê Israîl û Xezeyê, hem jî şerê ku li Lubnanê çêbû, li wir dengeyên siyasî hatin guhertin, bi dirêjahiya 15 rojan guhertinke pir mezin û bi lez li Sûriyê pêk hat, îro jî şer li Yemenê tê domandin, herwiha di navbera Îran û Israîlê de şerekî tund tê meşandin. Berî çend rojan Devlet Behçelî got ku metirsî li ser Tirkiyê jî heye û wê piştî Îran dora Tirkiyê were. Ev tê wê wateyê ku xeteriyeke pir cidî li ser Tirkiyê heye û sedema gavavêtina ber bi Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de ew e ku dewleta Tirk neçar e. Dewleta Tirk ji ber xeteriya li ser hebûna xwe riya pêvajoyê hilbijart. Êdî dem hat ku gelê Kurd mafê xwe bi dest bixe, li aliyekî din civak bê çek dikare têkoşîna xwe bidomîne ”

**‘Pêvajo fersendeke û divê Tirkiyê wê qezenc bike’**

Umer da zanîn ku divê dewleta Tirk derfeta pêvajoyê qezen bike û wiha domand: “Bi banga Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk Rêber Apo destwerdaneke dîrokî kir, Rêbertî vê pêvajoyê dixe xizmeta gelê Kurd, Tirkiyê û hemû gelên herêmê. Rêber Apo di nameyên xwe de yên ji bo Kongreya PKK’ê gotibû êdî divê PKK’ê xwe fesx bike, ji ber dem dema vê gavê ye, eger dewleta Tirk gavan biavêje neavêje, Rêber Apo pêwîstiyê bi vê biriyarê dibîne. Ev yek feresendeke dîrokî ye ji bo dewleta Tirkiyê, divê Tirkiyê jî gavan biavêje da ku feresenda dîrokî winda neke û ev pêvajo bikeve xizmeta gelê Kurd û gelên Tirkiyê. Lê eger dewleta Tirk tu gavan neavêje wê ev dewleta heyî di nav van guhertinên ku li herêmê rûdidin, were rûxandin û ji nîgariya Rojhilata Navîn were rakirin. Eger di şerê cîhanê yê yekemîn de dikarîbû bi riya dostaniya xwe bi Kurdan re xwe bibaparasta, vê demê jî eger bixwaze bidome, wê bi Kurdan re dikare bi rengekî din bi riya pêvajoya heyî, jiyan bike. Ji ber ku di serdema heyî de gelê Kurd xwedî proje, hêzeke mezin, siyasetê û tevgereke rêxistnkirî ne.”

**‘Rêber Apo dixwaze hemû hêzên Kurdan bibin yek’**

Endamê Rêveberiya Diplomasî a PYD’ê li Ewropayê Fûad Umer destnîşan kir ku ji bo yekbûyîna hêzên Kurdî Rêber Apo daxwaz kiriye ku rayedarên Kurdan bibîne û wiha got: “Li hin parçeyên Kurdistanê jî hêzeke Kurdan çêbûye, li Başûr herêmek û li Rojavayê Kurdistanê jî sîstemek



hatiye avakirin, li Rojhilat jî hêzeke rêxistinkirî amade ye. Em di qonaxeke nû re derbas dibin, lewma jî divê gelê Kurd ji vê qonaxê re amade bin, ji ber vê yekê Rêber Apo xwestiye bi hemû pêşeng û rayedarên Kurd re hevdîtinê çêbike, herwiha sedema din jî ew e ku pirsgirêka Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê yek e, ew ewleqedarî hev in, hev xurt dikin û hev lawaz dikin. Rêber Apo di çarçoveya Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de xwe bibe faktorek ji bo hemû hêzên Kurdan li hev bicivîne, hem jî wan bike yek dest û ew bi vê rolê rabe. Em dizanin ku di sedsala bûrî de gelê Kurd hate windakirin û mafî wî hat xwarin, lê di vê derfeta dîrokî de divê vê fersendeyê winda neke. Em dizanin ku pêvajoyeke girêdayî aştiyê di Rojhilata Navîn de tiştekî herî zehmet e, lê di van guhertinên ku rûdidin, pêwîst e gelê Kurd bibe xwedî rol û misiyon.”

## Îran dê bikare ji bin wan êrîşan rabe?



**Zekî Bedran**

Weke dihat hêvî kirin DYA, tevlî êrîşên li ser Îranê tên kirin bû. Êrîşên li ser Îranê tên qewimandin, kiryarekê ku tenê Israîl li serê xwe pêk bîn e yan jî, rûxmê zextê DYA jî ne pêkan bû. Êrîşên li ser Îranê berhema plansaziyekê berfireh û demdirêj dihat nîqaş kirin bû. Ev plansazî hêza Trump jî derbas dikir. Israîl wê plansaziyê weke ku girêdayi wê ye pêşkêşî raya giştî dik e. Ji aliyekê ve jî ev nêrîn rast e, ji ber ku welatekî weke DYA piştevanî digire û xist di nav şer de. Ev tê wê wateyê ku rêziknameya ku ji bo hêzên ku Rojhilata Navîn li hev dikin û nûve vesazdikin, hatine plankirin. Encamên wî şerê ne ten ê, bi Rojhilata Navîn ve jî sînordar e. Ev di serî de jî DYA, piştgiriya hemû hêzên Ewropî pêkhat. Israîl bi hinceta êrîşên Hamasê serkêşî girt di destê xwe. Hizbûllah, Hemas têkbir û Xezza jî wêran kir. Sûriyê û rejîma Baas jî da hilweşandin. Îran li Rojhilata Navîn tenê hat hiştin û di nav sînorên wê de hat fetisandin. Niha jî, Îran di bin pêlek êrîşan ya mezin a wêranî de ye da ku rê li ber wê bigire ku çekên nûkleer û kimyewî bi dest nexe. Ti hêz an jî saziyeke navneteweyî tine ye ku dikare êrîşên li ser Îranê rawestîne û destwerdanê jî jê re bik e. NY jixwe di bin serdestiya DYA û hevalbendên wê de ye. Van dewletan mafê dijberiyê hene. Ti biryar nayê dayîn, û heta ger were dayîn jî, Îsraîl û DYA dê tevlî wê biryarê nebin. Rûsya û Çîn dê pir bi bandor nebin. Bi kurtasî, cîhan qet ne di rewşek bi ewle de ye. Hevsengiyên ku di Şerê Cîhanê yê 2’emîn de hatine avakirin hildiweşin, û yeka nû nehatiye damezrandin. DYA û hevalbendên wê ew in ku hewl didin wê ava bikin û ji nû ve vesaz bikin. Rûsya bi şerê Ukraynayê ve sînordar bûye û pê re mijûl dibe. Bandora wê li Sûriyê şikestiye, û ew jî nikare ji bo Îranê pir tiştî bike. Yên ku Rojhilata Navîn serweriyê dikin, bi xwezayî dê li deverên din ên cîhanê jî serdest bibin. Heqê herî mezin ê êrîşa Îsraîl û DYA li ser Îranê ew e ku pêşî li bidestxistina çekên nukleerî bigirin. Êdî kes vê heqê napirse. Wan ew wekî heqek dadperwer û guncaw pejirandiy e. Tişta balkêş ew e ku kesên ku ji bo pêşîgirtina li hilberîna çekên nukleerî dengek wisa derdixin jî xwediyê çekên nûkleerî ne!

Îran li herêmê wek gefek ji bo Îsraîlê dihat dîtin. Hejmareke girîng ji welatên din ên Erebî bi rêya Peymanên Îbrahîmî peywendiyên xwe bi Îsraîlê re asayi kirine. Di dawiyê de, Sûriyê jî tevlî vê eniyê bû. Ger Îran bêbandor bibe, ti hêzek din namîne ku Îsraîlê ji holê rake û zextê lê bike. Iraq hîn jî ji Îsraîlê dûr e, lê gava Îran were xistin, ew ê nikaribe serweriya xwe biparêze. Iraq bi her awayî di hindirê xwe de avahiyek siyasî û civakî ya domdar tine ye. Dê ne dijwar be zêde ku ji bona Iraq bi Îsraîlê re li hev bike. Sedemeke din tine ye ku Tirkiye bi Îsraîlê re li hev neke. Ji dema ku Îsraîl hatiye damezrandin, Tirkiye yekem dewlet bû ku ew nas kir û peywendiyên herî baş pê re danî. Çîroka hezkirina Erdogan ji bo Îxwanan û avakirina bandorê li Rojhilata Navîn bi rêya wan bi her awayî qediya ye. Xwestekek heye ku bi girtina HTŞ’ê wekî piştgiriyek moral û bandorê ava bike, lê wan jî pejirandiye ku ew ê ji bo Îsraîl û DYA nebin asteng. Bêyî DYA û Îsraîlê ne gengaz e ku HTŞ’ê li Şamê bimîne. Erdogan vê yekê pir baş dizane, û ew e ku HTŞ’ê nêzîkî Amerîkayê kir û parazvaniya HTŞ’ê kir.

Weke xûlase, Îran tenê hat hiştin û armanckirin. Îsraîlê bi guhertina demê di çarçoveya amadekariyên hatine kirin de êrîşek da destpêkirin. Niha DYA jî tevlî wan êrîş û pevçûnan bûye. Wan ragihand ku armanca wan ya sereke, binesaziyên çekên nukleerî, ji holê rakirine. Tenê di DYA de çekên ku waan êrîşan dikarin vê yekê bikin hebû. DYA jî bi van çekan êrîşa yekem da destpêkirin. Wan daxuyaniyek da û got ku wan rê li ber hilberîna çekên nukleerî girtiye. Lê, Îsraîl dibêje ku ew ê êrîşan bidomîne û li arrmancên diyarkirî bixe. Her çend berê xistibe û parastina wê ya esmanî bêbandor bûye jî, ew dixwaze Îranê bêtir qels û bê hêztir bixîn e. Her çend ew dibêjin ku armanca wan guhertina rejîmê nîne jî, nayê gotin ku ew vê yekê naxwazin. Îran dibêje ku ew ê radest nebe û dê bersiva êrîşan bide. Di vê rewşê de, dibe ku DYA tevlî êrîşê bibe. Ev nîşan dide ku şer dê dirêj bibe û bandorên wê dê belav bibin. Bi rastî, daxuyanî hatine dayîn ku Girava Hurmuz dê ji hêla Îranê ve were girtin, û parlamentoyê li ser vê mijarê biryarek girtiy e. Welatên Îslamî bi temaşekirina êrîşan razî ne. Di dawiyê de, wan ragihand ku ew wan êrîşên li ser Îranê şermezar dikin. Wezîrê Derve yê DYA, rewş wiha diyar kir, “Raste wan şermezar kirin lê ew dibêjin ku ew di danûstandinên li gel welatan hatine kirin de dan xuyakirin ku piştgiriyê didin me.” Hemû ev hêz dixwazin Îran qels bibe û bêbandor bibe. Dewletên bi bandor ên Ewropayê jî ragihandine ku ew piştgiriyê didin DYA. Ew dibêjin ku divê Îran şertên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê bipejirîn e. Gelo rejîm li Îranê dê hilweşe, dê aloziyên navxweyî çêbibin? Ger şer di vê rewşê de bi dawî bibe, rejîm dê hebûna xwe bidomîne. Gelên ku li Îranê jîyan dikin û derdorên demokratîk ne ewqas rêxistinkirî û komî li ser hevin. Lê Îran êdî navegere Îrana kevin. Gelê Kurd hinekî din birêxistin e û di rewşa heyî de xwedî derfetan e. Lê, ew ne alîgirê ketina şerekî çekdarî bi Îranê re ne. Ew ji bo Îranek demokratîk goftugo û rêbazên aştiyane rast û guncawtir dibînin….

## Pêşî lêgirtina şer



**Farûk Sakik**

Li cîhanê dema şer û pevçûn dest pê dikin, ji her deverî banga aştiyê tê kirin. Aştî peyvek e ku hêvî dide mirovan. Şer çiqas sar û bi êş be, aştî ewqas aram û germ e.

Lê her wek hin alî, kes, kesayet, sazî, înîsiyatîf, dewlet li benda şer in ku dest pê bike û ew jî aştiyê biparêzin. Gelo van kesan çima dema ku bêhna şer dihat û şer gav bi gav nêzik dibû, nediketin nav liv û tevgerê. Bal bikişandina ser şerê ku nêz dibe. Diviya mirovahî bixistina nav tevgerek wisa ku pêşî li vî şerî bigirtina. Aha şerê Îsraîl û Îranê herkes li benda vî şerî bû û tu kesî hewl neda ku pêşî lê bigire. Em komî ser hev bikin. Em manşetek wiha bavêjin: Mîsyona mirovahiyê; dawî lê anîna şer nîne, pêşî lê girtina destpêkirina şer e. Li Kurdistan, Filîstin, Sûrî, Iraq, Îran, Ûkranya kengê wê şer des pê bike me texmîn dikir. Lê ji bo ku ev dîrok ev roja reş hîç neyê, tu tiştek an jî tu hewldanek çênebû. Em vegerin Kurdistanê. Li Kurdistanê şer tune. Êrişên tunekirin û qirkirinê hene. Li hember van êrişan jî parastinek xweKurdistan heye. Fuzeyên Kurdan tune bûn wek Îranê bersiv bidin rokêtên Îsraîlê an jî bersivên Ukranya dida Rûsya. Hêzek me ya ku em bersiv bidin jî tune bû. Di sala 1984’an de hêza me gerîla hebû me şer kir û em bi ser ketin. Di salên 1990’î de êdî vî şerî mîsyona xwe temam kiribû. Di vî şerî de Kurdan bersiv didan êrişên îmha, tunekirin û asîmîlasyonê. Armanca Kurdan tu carî bajarek, gundek, taxek an jî kolanek dijmin bidest bixin nebû.

Di salên 90’î de bi têkoşîna tevgera azadiyê û şerê gerîlayên Kurdistanê asîmîlasyon hatibû seknandin. Îroj Rêber Apo ji bo şer dest pê nekin têdikoşe. Ew talûkeya gav bi gav nêz dibe dibîne. Ji bo vê yekê banga aşitî û civaka demokratîk dike. Ev bang ne tenê ji bo Kurdan e, di heman demê de, ji bo dagirkerên Kurdistanê ye jî. Encamên feleketa şeran bi bîra wan dixe. Ne wek wan kesên alîgirên aştiyê û li benda şer dest pê bike nasekine. Bi paradîgmaya xwe perspektîfên cuda dide pêş çavsorên şerxwaz. Ne wek wan kesên alîgirên aştiyê û li benda şer disekinin. Bi paradîgmaya xwe perspektîfên cuda dide pêş çavsorên şerxwaz. Riyên çareseriyê yên wek konfederalîzma demokratîk dide pêş wan.

Ji bo doza Kurdistan jî îroj di nav hewldaneke bi vî rengî de ye. Hin caran tavîzan dide, hin caran sebir dike, hin caran hêrs dibe, lê di dawî de tê famkirin. Îroj wan kesên nijadperest jî pê bawerî tînin. Lê hin alî di nav Kurdan de hene, bi zanebûn ji peyamên Rêber Apo hin peyvan derdixin û li gor xwe şîrove dikin. Mejiyê civakê jî bi van şîroveyan şêlû dikin. Rêber Apo, bi banga xwe ya herî dawî, pêşî li şerekê ku wê Tirkiyê jî wek Îranê dest pê bike, digire. Heman riyên çareseriyê û demokratîkbûnê dabû pêş rêveberiya Tehranê jî. Heger demokrasî li Îranê hebûya, heger gel piştgirî bida vê sîstemê, wê wisa bi hêsanî rokêt ji Îsraîlê bi rê neketina. Bi tenê man. Lê Kurdên Rojhilat û tevgera wan PJAK îro li gorî perspektîfên Rêber Apo tek riya çareseriyê neteweya demokratîk a gelan dide pêş dewleta Îranê û dibêje; Kurd alîgirê rêveberiyeke hevpar in, ne alîgirê şer in.

Aştî pîroz e lê pêşîgirtina li şer pîroztir e.